

Dadweriya aqilmendekî

Rêberê Silivî

Weke gelek Kurdên me yên belengaz û perîşan, ku ji dest xizaniya malmîrat a çend sal in li deverên Kurdî di Sûriyê de kon vegirtiye, dost û hevalê minî Kevin, **Eliyê Azîzî** jî, tevî kufletê xwe yê giran, ji bo kar, ji bo man û jiyane, gundê bav û bapîran li şûn xwe hiştiye û li bajarê **Şamê** cîwar bûye. Weke berê, tevî xaniyê bi kirê, tevî kêmbûna derfetên kar, tevî destengî û rewşa wî ya aborî a xirab jî, ew mirovekî dilfireh, mêvanhez û têrgotin e, gelek çîrok, metelok û serpêhatiyên bav û kalan ji ber kirine. Nîsana vê salê, min beşdarî di şevbuhêrkeke wî de kir, hin çîrok û serpêhatiyên xweş ji me re gotin, naveroka yekê ji wan jî ev bû:

Aqilmendekî zîrek û hişmend li deverê welêt dijî, hemî problemên xelkê wê deverê li ser destê wî çareser dibûn. Kurekî wî hebû, dilê wî bi dadweriya bavê wî ne xweş bû, piştî wî ji biryarên wî ne rast û bi gûman bû. Rojê buharê, ew li hespa xwe siwar bû, ji malê derket û li konekî buhariyan bû mêvan. Xwediyê malê bi du jina ye, jina mezin bê zarok e û ya biçûk kurekî şîrmij li ser desta ye.

Dem, piştî nîvro ye, xwediyê malê bi pez û sewalên xwe ve mijûl e. Mêvan, li milê zilaman, serê xwe danî ser balgihekî da hinekî vehese. Dengê jina biçûk kete guhê wî, ji hewiya xwe re dibêje: "Ezê herim hin qurmik û qirşikan ji çolê bînim, vaye min kurê xwe di dergûşê de razandiye, hema haya te jê hebe". Hewiyê jê re got: "Bila". Dema diya lêwik ji bin kon derket, sed û yek gûman di serê mêvên de geriyar, weke sed kes jê re bibêje: "Mêvano! Çavên xwe veke, şiyar be, wê tewanek di bin vî konî de bigewime!!". Mêvanê şiyar, di bin çavan re dît ku hewiya jinikê dîq dike da zanibe ka bê mêvan razayî ye yan şiyar e.

Dema wê ew dirêjkirî dît, texmîn kir ku ew razayî ye, bi lez ew ji ber çavên wî winda bû. Mêvan, hêdî- hêdî, bê deng rabû ser xwe qelawizî lê kir, dît ku rahişte derziya dirûnê û ber bi dergûşa lawikê razayî ve çû, perde ser hilanî, bi hovîtî û dirindeyî ew derzî di xavika serê lawikê bê guneh de çikand û tê de winda kir, perde bi ser de berda û vegeziya cihê xwe rûnişt..!! Kurikê reben, du deng girî kirin, lê, dengê wî yekcarî ji dinya ronak hate birîn!!..



Piştî ku mêvan ev bûyera bi seyr dît, ew jî vegeziya cihê xwe, serî danî ser bêlgih çav girtin heçku ew raza ye. Piştî demekê, diya lêwik ji çolê vegeziya, piştîyê xwe danî, mêrê wê jî li malê bû, dîna xwe dayê ku kurikê wê di xeweke giran de ye, li bendê ma da şiyar bibe wî şîr bide, lê lawik şiyar nebû!. Diya wî ew ji dergûşê deranî, lê malpepûkê çî bibîne!! Kurekî mirî, xiloxavî, bê giyan û bê can!! Kire qêrîn, kire hawar, bi tepan bi serê xwe ket, pora xwe kişand...Lê, hemî bê sûd û bê feyde ye, tu carî, girî mirî venegerandine!!..Hewiya wê jî xwe bi girî kuşt, di ber re ji diya lêwik re dibêje: "Ez rebena te me, te kurik kuşt, wî xiste dergûşê û derketî da tu xwîna wî tîxî stuyê min!!".

Ji bo naskirina rastiyê, bavê lêwik, cendekê kurê xwe û herdu jinên xwe birin ber destê aqilmendê deverê, ango, bavê mêvan, ew mêvanê ku rastiyê hemî dizane û ew bi çavên serê xwe dîtiye. Lê wê ji tu kesî re nabêje ka wê biryara bavê wî rast be yan na!! Aqilmend xwe ji civatê bi dûr xist, gazî diya lêwik kir û jê re got: "Keça min, ma kesekî bi hiş li ser rûçkê vê zemîne heye **D.R (10)**